

Danezana gerdûnî ya mafên mirovî (*)

Wergêr: Dr. Kamîran Bêkes

Sereta

Ji ber ku venasîna rûmeta pêgir a hemû endamên malbeta mirovî û mafên wan ên wekhev û payedar li cîhanê bingeha azadî, dad û aştiyê ye;

Ji ber ku piçûkdîtin û rêzlênegirtina mafên mirovî bûne egera kiryarên hov yên ku wijdana mirovhiyê bi tundî azar kirine, û ji ber ku avakirina cihanekê, ku tê de mirov di peyvîn û bawerkinê de serbest bin û ji tirs û belengaziyê rizgar bin, wek xwasteka bilindtirîn a tevahiya mirovatîyê hatiye danezankirin;

Ji ber ku girîng e mafên mirovî ji alî destlata yasayî de bên parastin da ku mirov bêçar nebe ku, wek çareya dawîn, penayê serhildana li dijî zordarî û çewsandinê bibe;

Ji ber ku pêşvebirina peywendiyên dostaniyê di navbera neteweyan de bingehî ye,

Ji ber ku gelên Neteweyen Yekbûyî di Peymana (destûra) xwe de ji nû ve bawerîya xwe ya bi mafên mirovî yên bingehîn, bi nîrx û rûmeta kesayetiya mirovî û bi wekheviya mafên mîr û jinan dane zanîn, û ji ber ku biryar dane ku alîkariyê bidin pêşveçûna civakî û bicihkirina asteke jiyane ye çêtir di nav serbestiyeke firehtir de;

Ji ber ku dewletên endam li xwe girtine ku, bi hevkarîya Neteweyên Yekbûyî, ji bo peydakirina rêzgirtin û çavdêriyeke giştî ya bi mafên mirovî û azadiyên bingehî, kar bikin;

Ji ber ku têgihîştina hevbeş a van maf û azadiyan ji bo bicîhanîna tevaya vê lixwegirtinê ji giringiya bilindtirîn e,

Iewre Civîna Gelemper vê Danezana Gerdûnî ya Mafên Mirovî wekî asteke hevbeş **radigihîne** ku divê armanca hemû gel û neteweyan be, da ku hemû kes û

hemû desteyên civakê vê Danezanê timî li ber çav bigrin û, bi riya hînkirin û perwerdekirinê, li pênavî çespendina rêzgirtina van maf û azadiyan bixebitin û bi tevdîrên pêşketî yên neteweyî û navneteweyî nasîn û bicîhanîna wan ya gerdûnî û karîger, çî di nav gelên dewletên endam bi xwe de, çî jî di nav gelên wan deverên ku li jêr desthilata wan de ne misoger bikin.

Benda 1.

Hemû mirov azad û di rûmet (paye) û mafan de wekhev ji dayik dibin. Hiş û wijdan bi wan bexşkirî ne û divê ligel hev bi giyanê biratiyê reftar û têkildar bibin.

Benda 2.

1. Ji mafê herkesekî ye ku bê tu cidahiyan, wek cidahiya bi hoya nijad, reng, zayend, ziman, ol, ramana konevanî (siyasî) yan her ramaneke dî, binemayê netewî yan a civakî, sermiyan, zayîn an tu rewşên dîtir, hemû maf û azadiyên ku di vê danezanê de hatine binavkirin bi dest xîne.

2. Bi ser de, nabe tu cidahî ji ber statuya rêzanî, yasayî an navneteweyî ya welat an navçeya ku kesek jê tê, bête kirin, çî eger ew welat an navçe serbixwe, li jêr dest, ne xweser (otonom) an li jêr her sînorkirin û bendkirineke din a serweriyê be.

Benda 3.

Herkes xwedî mafê jiyane, azadî û ewlehiya kesane ye.

Benda 4.

Nabe tukes di koletî an bindestiyê bête girtin; koletî û bazirganiya koleyan bi hemû teşeyên xwe ve qedexe ye.

Benda 5.

Nabe tukes toşî hingavtin an sizadan û reftareke hov, nemirovane û kotîker bibe.

Benda 6.

Herkesî maf heye ku li her cîyekî weke kesayetiyeke yasayî bête venasîn. →